



AKP bi xwîna kurdan dikeve hilbijartinê

Hevserokê HDP'ê Sezai Temellî, di serdana Mûşê de politîkaya AKP'ê ya şer rexne kir û wiha got: "Kengî hilbijartin nêzik dibe iktidar bi xwîna kurdan diçe hilbijartinê." ... R.3



Li Şîrnexê îstikên hilbijartinê

LEŞKER Û POLÎSAN QEYD DIKIN

- Hikûmeta AKP'ê ji niha ve li Kurdistanê dest bi dek û dolabên hilbijartinê kir. Ji bo di hilbijartina herêmi ya 31'ê adara 2019'an de dengê xwe li navenda Şîrnex û Bêşebabê bi kar bînin qeyda nêzî 3 hezar leşker û polîsan hatiye çekirin. Her wiha tê diyarkirin ku heman rewş li navçeya Silopî û Cizîrê jî didome.

BANGA VEGERÊ LI GEL KIR

- Parlamenterê HDP'ê yê Şîrnexê Huseyîn Kaçmaz got ku wan ev yek ji çavkaniyên bawerî bi wan tê teyîtkirîye. Kaçmaz anî zîman tê gotin ku wê 4-5 hezar qeydên din jî li her du navendan bê kirin û heman rewş li hin deverên din jî rû heye. Kaçmaz xwest kesên ku koç kirine qeydên xwe li Şîrnexê çêbikin. RÛPEL - 3

@rojname

19 Kanûn - Çarşem 2018 E-mail: e-rojname@hotmail.com Hejmar: 209

Keziyên bi bêhna rihanan



Sir û seqemek ku dil dilerizand li ser rûyê bajarekî kevnar xwe danîbû. Di nav wê sermayê de du keziyên bi bêhna rihanan ku 7 rojan di nav xwînê de mabûn, bûbû şahidê firîna çivîkên ku di berbanga sibehê de çavên xwe bi dengê tank û topan vekiribûn. Çivîkên ku rengên çavên xwe ji keziyên ji bêhna rihanan û di nav xwînê de mabûn... RÛPEL - 2



‘Em xwediyên vê axê ne’

Bi sedan şêniyên bajarê Minbicê û gundên wê gefên Tîrkiyeyê yên dagirkirina herêmên bakur û rojhilatê Sûriyeyê şermezar kirin û diyar kirin ku dê li hemberî êrişan bisekinin û wiha gotin: “Em xwediyên vê axê ne.” ... RÛPEL - 3

NÛNERÊ DYA'YÊ:

HSD parçeyek civaka Sûriyeyê ye... R.4



Pêşmergeyên Roj bûne maşîk

Piştî serokê AKP'ê Tayyip Erdogan bi daxuyaniyan gef li bakurê Sûriyeyê xwar û got, “Em ê di demeke nêzik de derbasî rojhilatê Fîratê bibin” Tê gotin ku bi fermana Tîrkiyeyê, Pêşmergeyên Roj derbasî sînorê bakur û rojhilatê Sûriye bûne... R.3

ŞADIYA OMERE:

Do îşgalkerdîş û faşîzm vindî bikerê... R.5

Tîpa F li her derê belav bûye

Dewleta tirk di 19'ê kanûna 2000'î de ji bo girtîgehên Tîpa F di bin navê ‘Vegera Jiyanê’ de li girtîgehan operasyon pêk anî 28 girtî hatin qetilkirin. Şahidê wê komkujiyê Veli Sağılık got ku bîngeha pêkanînen roja îro 18 sal berê hatiye avêtin û AKP li ser vê bîngehê avahiyên bilind ava dike.

Li Rojhilat çalakiya grevê



Çalakiya greva birçîbûnê li çar parçeyên Kurdistanê û gelek welatên cihanê dewam dike. Li Rojhilatê welat komekê û siyasetmedar Gultan Kîşanak jî dest bi grevê kirin

KET ROJA 42'YEMÎN

Ji bo tecrîda li ser Rêberê Gelê Kurd Abdulah Ocalan rabe hevseroka KCD'ê Leyla Guven greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger da destpêkirin û grev îro di roja 42'yemîn de ye. Çalakiyên li dijî tecrîdê roj bi roj li çar aliyên cihanê belav dibin. Her wiha li rojhilatê Kurdistanê komekê ragihand ku ji bo tecrîdkirina Ocalan bi dawî bibe dest bi greva birçîbûnê kirine.

KÎŞANAK JÎ DI GREVÊ DE YE

Hevşaredara Bajarê Mezin a Amedê Gultan Kîşanak jî li girtîgehê dest bi greva birçîbûnê kir û wiha got: “Ji bo tecrîda li ser birêz Ocalan bi dawî bibe ji îro û şûn de ez dikevîm greva birçîbûnê ya 10 rojan. Divê hemû wîjdanên demokrat berpirsariyê hilgirin.” Her wiha bi heman armancê li navçeya Mîçûrînsk a bajarê Tambovê yê Rûsyayê jî greva birçîbûnê hat destpêkirin... RÛPEL - 3

CPT gureyê xo nêkeno

Serekê Pêroyî yê Komela Heqê Merdîman (ÎHD) Oztürk Turkdoganî da zanayîş ke tecrîdê Îmraliyî hindî agêrayo bi îşkenceyî, CPT gureyê xo nêkeno û Konseya Ewropa zî binpaykerdişanê heqan ê ûcayî rê bi hawayêkê siyasiyî nîzd bena û va: “No tecrîd heman wextî de serê hemeyê cîmatî de zî yeno bicaardene. Gureyê CPTyî vernîgirewtîşê îşkenceyî yo. Eke CPT herînda vernîgirewtîşê de bi bêxemî têgêrena no yeno na mana ke gureyê xo bica nêana.” ...

R/5

Zemên tîn kirin pişta wan şikand

Hostayên yemenîyan ji ber krîza aborî bi gazinc in û destnîşan kirin ku kar tune ye û zemên tîn kirin pişta wan şikandiye



Li Dîlokê yek ji hunerên destkariyê ya girîng yemenîvanî ye. Krîza aborî bandor li yemenîvaniyê jî kir. Hosteyê yemenîyan Adil Keskinsoy, destnîşan kir ku ji ber krîza aborî û zêdebûna malîyetê rewşa karê wan xirab e. Keskinsoy, da zanîn ku par wan cota yemenîyan bi 55 lîreyan çêdikir lê niha ew bi 70 lîreyî çêdikin. Her wiha Keskinsoy got malzemeyên wan jî ji sedî 50 biha bûne. Keskinsoy da zanîn ku turist jî êdî yemenî nakirin, tîn dinîhêrin û diçin.

Dewlete nêwazena qetliyam bêra aşkerakerdiş



Ewro serrgêra Qetliyamê Gumgumî ke 19ê Kanûna 1978î de pê ameybî ya. Qetliyam ra nata 40 serrî derbaz bî. Hedîse hewteyêk dewam kerd û elewîbîyayîşê xo vera 111 kesî ameybî qetilk-erdiş, zêdeyê 100 kesî birîdar bibî û 70 kargehî ameybî veşênayîş. Şahidê qetliyamî ra nuşttox Azîz Tunçî qala Qetliyamê Gumgumî kerd... RÛPEL - 5

Dîcle di hezarî serrî yo winasî nêdî



Qezaya Gêlî yê Amedî de visiyyayîşê qapaxêkê Awbenda Dicle ra dima berzbîyayîşê sewîyeya awe ya Royê Dicle hewna zî dewam kena. Dicle yo ke tede ge-ge berzîya awe resena 6 metreyî. Ekolojîste Guner Yanlıçe qisey kerd û daye zanayene ke muxadeleyê ke Royê Dicle ser o yenê kerdene bîyî sebebê nê netîceyan. Baxçeyanê Hewselî zî rarêko pîl dî... RÛPEL - 5



Der barê jinên ketin greva birçîbûnê de lêpîrsîn vekirin

AMED - Grevên birçîbûnê yên ji bo tecrîda giran a li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan bi dawî bibe, didomin. Tevî rojnameger Kîbriye Evren der barê 3 kesên ku di 16'ê kanûnê de dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger kiribûn, ji aliyê rêveberiya girtîgehê ve lêpîrsîn da vekirin. Rêveberiya girtîgehê

xwestin ji Kîbriye Evren û jinên din xwest ku devkî yan jî nivîskî parastinê bikin. Kîbriye Evren, Elif Kaya û Hîlal Olmez dest bi greva birçîbûnê ya bêdem û dorveger kiribûn û hat hînbûn ku jinên bi navê Ozlem Seyhan, Edanur Bazencir û Kubra Barutçu jî dest bi greva bidem û dorveger kirine.

02


Roj roja xwedîderketinê ye

Pîştgiriya ji bo çalakiya greva birçîbûnê ya Leyla Guven a ku ji bo rakirina tecridê daye destpêkirin, didome. Jinên Mêrdînê piştgiri dan Leyla Guven û anîn ziman çalakiya ku Guven daye destpêkirin ji bo vîna jinê girîng e û gotin ku li dijî tecridê roj roja xwedîderketinê ye

Çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger a hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven a ji bo rakirina tecrida li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan daye destpêkirin ket roja 42'yan. Piştgiriya ji bo berxwedana Leylayê her diçe mezin dibe.

Jinên Mêrdînê jî piştgiri dan Guven û anîn ziman çalakiya ku Guven daye destpêkirin ji bo vîna jinan gelek girîng e û diyar kirin ku divê piştgiriya ji bo Guven mezin bibe.

Tecrid bandorê li ser civakê dike
Rêvebera DBP'ê ya Qoserê Xatûn Arslan anî ziman ku greva birçîbûnê ya Guven daye destpêkirin vîna hemû jinan e û wiha got: "Ger em gelê kurd îro xwedî li Leyla Guven derbikevin bawer dikim ku em ê pêş bikevin. Çawa ku jin



di nav şer û êrîşan de pêş ketiye, dema piştgiriya bidin Guven dê tecrida li ser Abdullah Ocalan jî bê şikandin. Îro

tecrida ku hatiye giran kirin bandorê hem li ser gelê kurd û hem jî li ser girtiyan dike. Lê em jin îro bi vîna xwe dikarin ve tecridê bişikînin."

Dê çalakî bidomin

Di axaftina xwe de Arslan da zanîn çalakiya ku îro Guven daye destpêkirin gelek girîng e û wiha domand: "Çawa ku Serok îro jin aniya vê astê û jinan hebûna

xwe nas kir, Leyla Guven jî ji bo ev tecrid bi dawî bibe dest bi vê çalakiyê kir. Divê îro bi taybetî jî jin piştgiriya bidin Leyla Guven û greva birçîbûnê divê em li her derê bidin berdeawamkirin. Îro roj roja xwedîderketina li çalakiya ji bo bidawîkirina tecridê ye. Heta tecrida li ser Serok neyê şikandin em ê dev ji çalakiyên xwe bemedin."

'Divê gelê kurd rabe ser pêyan'

Xatûnê, di dirêjiya axaftina xwe de got ku Leyla Guven îro li vîna jinê ya azad xwedî derdikeve û bang kir ku hemû kes deng bidin dengê Leyla Guven û ev tişt got: "Îro roj roja dengderxistinê ye. Divê îro hemû gelê kurd rabin ser pêyan. Îro jî ber ku gel û jinên me deng derdixin tînin binçavkirin. Em vê yekê qebûl nakin û em dixwazin ku hemû kes di demek nêz de rabin li ser pêyan."

'Leyla vîna jinan e'

Hevseroka Komeleya 78'an a Mêrdînê Hezbiye Uşenmez jî anî ziman ku heta Ocalan azad nebe û tecrid neyê rakirin şerê heyî naqede û got ku îro ew jî bo azadiya cihanê vê têkoşinê didin.

Her wiha Uşenmez diyar kir ku Guven ji bo jinan gelek girîng e û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Leyla vîna jinan e. Em tim bi wê re ne û heta dawî jî em ê bi wê re bin. Em ê wek jinên azad û serbixwe tim xwedî li Leylayê derbikevin." **MÊRDÎN**



Keziyên bi bêhna rihanan ên ku di nava xwînê de mabûn

ROZA METÎNA



Sir û seqemek ku dil dilerizand li ser rûyê bajarekî kevnar xwe danibû. Di nav wê sermayê de du keziyên ji bêhna rihanan ku 7 rojan di nav xwînê de mabûn, bûbûn şahidê firîna çivîkên ku di berbanga sibehê de çavên xwe ji dengê tank û topan re vekiribûn. Çivîkên ku rengên çavên xwe ji keziyên bi bêhna rihanan û di nav xwînê de mabûn girtibûn jî, bûbûn şahidê kêliyên ku di nav diranên şevşevokên har de asê mabûn. Kêliyên ku di ser re 3 sal derbas bûn, ruh dabû rastiyeke dîrokî. Di nav rastiyan dîrokî de gelek çirokên ji xêzên li ser rûyê temenê 57 salî hebûn. Temenên ku di rêya têkoşinê jî bo azadiyê de çong netewandibûn. Temenên ku li dû xwe 11 zarok û li laşê sar şopa 10 guleyan hiştibûn, şahidê herî mezin ên dîrokê bûn.

Dê zû zû bihata jîbîrkirin gelo çavên girtî ku şahidên herî mezin ên dîrokê bûn û li şibakê nêrînan neçar ku bawer nedikirin dê dayika wan bi windakirina xwînê jiyan xwe ji dest bide. Çavên ku li şibakeyê bi şev û roj nobedartî ji qêrîna ku ji laşê sar difûriya ezmanan, dikirin, nizanibûn xew çî ye. Yezdanê ku qêrîna laşê sar bi guhên xwe bihîstibû, li kîjan şibakeyê nobetdari dikir gelo? Dê hin çend qêrînan din li qata 7'an a asîmanan bihata bihîstin?

Jinên berxwedêr ên ku dengên tililiyên wan li ser baskên xalxalokên biharê direqisin, dê tu carî vê qêrînê ji bîr nekin û derkevin qatên 7'an ên asîmanan û hesabê 7 rojan dê bipîrsin. Ji bo êdî keziyên ji bêhna rihanan ên dayikan bi xwîna sor nexemilên. Dayikên bi çanda dengbêjiyê mezin bûne û li dû xwe mîrateyeke giranbiha hiştine hêviyek ji xelekên rojê ne. Kî dizane dibe ku niha dayikên wekî Taybet ji deriyekî tîrêjên rojê li dû xwe hewandiyê li me dinîhêrin. Dibe ku bi nêrînan wan ên ji dilê geş û pak newayên ji bo doza azadiyeke mayînde, li asîmanan tînin berzîkirin.



'Em ê li dijî gefan yekitiya xwe xurttir bikin'

Bi dirûşma 'Bimire dagirkeriya Osmanîyan bijî vîna gelên Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê' li dijî gefên dewleta tirk li gundê Babinêşê yê Şehbayê meşek girseyî hatibû lidarxistin. Jinên ku beşdarî meşê bûn axivîn û gotin ku kes bila nefikire ku ew bi hêsanî dikarin gelê kurd têk bibin.

Jinan anî ziman ku ew li dijî gefên Erdogan bêdeng namînin û wiha gotin: "Ji bo gefên Erdogan vala derkevin em ê yekitiya xwe xurttir bikin. Jinên ku îro daketine qadan û di nava meşê de cih girtine dê tu carî bindestî û dagirkeriya Erdogan qebûl nekin. Çi qas Erdogan gef û êrîşên xwe li ser gelê kurd zêde bike li hemberî wî hêza gelê kurd xurttir dibe û tu carî nikare yekitiya gelan a li bakur û rojhilata Sûriyeyê de têk bibe. Îro bi hezaran zarokên gelê kurd li hemberî êrîşên Erdogan şer dikin, em ê tu carî paşde gav neavêjin, serkeftin û berxwedan dê her tim dirûşmeya me be." **ŞEHBA**

Bedêla qeyrana aboriyê jin didin

Hevberdevka Kongreya Civaka Demokratîk (HDK) Gulistan Kiliç Koçyîgît bal kişand ser qeyrana aboriyê û sedema bi bandorbûyîna jinan a ji qeyrana pergala kapîtalîst.

Koçyîgît destnîşan kir ku yên herî zêde ji qeyrana aboriyê bi bandor bûne jin in û sedema vê yekê jî newekheviya zayenda civaka kapîtalîst û bavîksalar e û wiha got: "Li kargeriyeke ewil ger jinek û mîrek divê ji kar bînin derxistin ewil jin tînin derxistin. Ji ber ferasetek wisa ye; divê mîr li malbatê binihêre. Pergala feodal newekheviyê kûr dike. Di civakên bavîksalar de jin her tim li plana dawî mane û mîr derketine pêş. Ango jin girêdayî mîran dimînin. Sînoren azadiya jinê li gorî şert û mercên mîran tînin diyarkirin. Ger tercîhek

li cihekî bê kirin jî ji alî mîr ve dikin."

'Qeyranê ewil jin betal hiştin'

Di axaftina xwe de Koçyîgît destnîşan kir ku encamên civakî yên qeyrana aboriyê girîng in û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Bandor çawa li jinan dike divê mirov li vî binihêre. Bi taybetî qeyran jinan betal dike. Jinên aboriya malbatê bi rê ve dibin zehmetiyan dikişînin. Jinên diçin bazaran gelek caran tiştekî nakirin an jî nivco dikirin. Di encama lêkolînan de derdikeve holê ku yên herî zêde di dema qeyranê de bi bandor dibin jin in. Ji encamên qeyranê jin bi du awayî bi bandor dibin. Ya yekem wek tundiya aborî û xizanî li jinan vediger ya duyem jî jinan xizan dike." **STENBOL**



Li kantona Şehbayê kelecana jinan a çandiniyê

Gelê Efrînê yên ku li kantona Şehbayê bi cih bûne tevî hemû derfetên kêm li ber xwe didin û ji bo debara xwe bikin



dest bi çandiniya wekî genim, nîsk, nok û hwd. kirin. Têkildarî mijarê jinên ku çandiniyê dikin axivîn û gotin ku ew bi

xebata xwe li ber xwe didin û li dijî dagirkeran bejna xwe natewînin.

Jina bi navê Fikret Mihemed anî ziman piştî dagirkerîna Efrînê ya ji aliyê dewleta tirk û çeteyên girêdayî wê ve,

ew li Şehbayê bi cih bûne û wiha got:

"Niha em li Şehbayê çandiniyê dikin. Gelê Efrînê evîndarê xwezayê ye. Niha jî tîkiliya me ya xwezayê gelek xurt e. Tu hêz nikare me ji xwezayê qut bike."

Henîfe Nesan jî da zanîn ku destpêkê wan erd ajotîne dûre tovên wek nok, nîsk û genim avêtine û wiha axivî: "Em niha xebatên xwe yên nava erd didomînin. Em dema ku tînin nav erd kelecaneke dilê me digire û em gelek xwe bextewar dibin. Ji ber ku em ji xweza û xebatê hez dikin." **ŞEHBA**

Li quntarê çiyayê Cûdî çêkirina tehîne



Li kaneke biçûk a li quntarên çiyayê Cudî ku 5 kilometre ji Şîrnexê dûr e jin bi destên xwe tehîne çêdikin. Jina bi navê Emîna Bayat ewil kunciya hişk dike, piştî germ dike û diavêje maşîneyê. Bayat 7 sal ein vî karî dike.

Neyê diyar kir ku ji sibehê heta êvarê dixebite û debara xwe bi tehîne dike wiha got: "Em du kes li vir dimînin. Em havîn û zivistanê dixebitin. Berê mezinên me vî karî dikirin. Jixwe cihê me jî cihekî kevn e. Em li vir kevneşopîya mezinên xwe didomînin. Karê me zehmet e lê mirov gelek girîngiyê didin tehîna me û eleqeyek mezin nîşan didin."

Di axaftina xwe de Bayat daxuyand ku ne tenê ji Şîrnexê na ji bajarên cuda jî mirov ji bo tehîne tînin vir û wiha domand: "Gel eleqeyek mezin nîşan dide. Yên tînin pir dicibînin. Ji her derê tînin dikirin. Gel dibêje teze û baş e. Ev tehîn bi kêrî her tiştî tê." **ŞÎRNEX**

Serlêdana jinan a ji bo hîlbijartinê zêde ye

Bi aşkerankirina roja hîlbijartinê herêmî jî aliyê Lijneya Bilind a Hîlbijartinê (YSK) ve, HDP'ê li her derê bi avakirina komîsyonan dest bi xebatên hîlbijartinê şaredariyê kir.

Li Colemêrgê jî komîsyona hîlbijartinê Melek Demîrcî der barê serlêdanan de agahî da û got ku li herêmê herî zêde jin serlêdanê dikin û diyar kir ku şaredariyên ku hatine xespkirin jin dê dîsa bi dest bixin.

Bila jin ji xwe bawer bin

Demîrcî anî ziman ku ev mehek e wan komîsyona hîlbijartinê ava kirine û wiha got: "Komîsyona me ya hîlbijartinê ev mehek e hatiye avakirin. Ev bi qasî mehekê ye em serlêdanan digirin. Bi taybetî ji bo ku jin di siyasetê de cih bigirin em di nav hewlêdanan de ne. Niha ger jin di nav siyasetê de cih bigirin dê têkoşîn mezintir bibe. Em ev hewlêdana jinan girîng û heja



dibînin. Tenê daxwaza me ew e ku jin ji xwe bawer bin û ji her qadên jiyane tev li siyaseta bibin. Serlêdanên me bi taybetî ji jinên ciwan pêk tê."

Her wiha Demîrcî da zanîn ku jin ji HDP'ê bawer in û jin bawer dikin ku rizgarkirina civakê bi HDP'ê pêkan e û wiha axaftina xwe bi dawî kir: "Jin dê bi xwedîderketina HDP'ê şaredariyên ku hatine xespkirin qezenc bikin. Em bawer û hêvîdar in ku dê bi jinan guhertin pêk were." **COLEMÊRG**



Pêşmergeyên Roj ên girêdayî dewleta tirk dîsa ketin rojevê!

Erdogan ALTAN / DÊRIK - MA

Piştî ku serokê giştî ya AKP'ê Recep Tayyip Erdogan li ser hev gefên 'Em dê bikevin rojhilatê çemê Fîratê', 'Wê êrişên me berdewam bikin' li kurdên bakurê Sûriyeyê xwar, Pêşmergeyên Roj ketin bakurê Sûriyeyê. Pêşmergeyên Roj ku ji aliyê PDK û Tirkîyeyê ve hatiye avakirin sinor derbas kirin û ketin tevgerê. Hat îdiakirin ku şandeyek ji rayedarên DYA, Tirkîye, PDK, ENKS û femandariya Pêşmergeyên Roj pêk dihat, li baregeha leşkerî ya Başîka ya ser bi Mûsilê ve, civînek hatiye lidarxistin. Civîna ku di 11'ê kanûnê (11.12.2018) de pêk hati de, careke din derbasbûna Pêşmergeyên Roj a Rojava ketiye rojevê.

Li gor agahiyan di civînê de ji endamên şandeya Tirkîyeyê ku li ser navê MIT'ê tev li bûye yê bi navê "Ruzgar" tê gotin ku ji endamên Pêşmergeyên Roj re gotiye ku 'De hadê ew perwerdeya ku me li Başîka da we niha tam dema wê ye ku bixin meriyetê. Em zemîna ji bo hûn bikevin Rojava amade dikin. Hin carinan biciribûn. Ji xwe dê Amerîka dengê xwe neke, firsend ev firsend e, va ye ji we re firsend bikevin Rojava.'

Hat diyarkirin piştî civînê hejmarek zêde ji Pêşmergeyên Roj di bin qontrola pêşmergeyên PDK'ê de hatine ser sinorê Dêrika girêdayê Herêma Cizîrê ya Federaliya Demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê. Lê hat diyarkirin ku li ser sinorê nuçtaya Sewêdê di navbêra wan û şervanên YPG'ê yên li ser sinorê nîqaş derketiye û piştî nîqaşê careke din neçar mane şûn de bizivirin.

Piştî civîna Tirkîye, PDK, ENKS û Pêşmergeyên Roj a li Başîkayê, şaxên ragihandinê yên girêdayê PDK'ê, careke din derbasbûna Pêşmergeyên Roj a Rojava xistin rojevê.

Li Rojhilat çalakiya greva birçîbûnê

Pêla çalakiyên greva birçîbûnê yên ji bo rakirina tecrîda li ser Ocalan, li rojhilatê Kurdistanê jî belav dibe. Koma ku dest bi grevê kir got ku şikandina tecrîdê erka hemû kesên azadîxwaz e

NAVENDA NÛÇEYAN

Ji bo rakirina tecrîda girankirî ya li ser Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan, çalakiyên greva birçîbûnê roj bi roj mezin dibin. Tevî bakur, başûr û rojavayê Kurdistanê û Ewropayê, niha jî li rojhilatê Kurdistanê çalakiya greva birçîbûnê hat destpêkirin. Di vê çarçoveyê de komeke çalakvanan bi dirûşma 'Azadî ji Rêber Apo re û mirin ji bo xwînîjî, mirovkuj û dijminên mirovatî û jiyana

azad re' dest bi çalakiya greva birçîbûnê ya du rojan kir.

Di daxuyaniyê de çalakvanan destnîşan kir ku faşîzm û modernîzma mirovîxwar û sermayedar bi şidandina tecrîdê re rêberê azadîxwaz ê cihanê hedef girtiye. Çalakvanan diyar kir ku ji bo ku Rojhilata Navîn her tim di bin dagirkerî û koletiya hêzên dagirker de be, tecrîda li ser Ocalan hatiye girankirin û got ku şikandina tecrîdê erka hemû kesên azadîxwaz e.



Çalakvanan bal kişand ser çalakiya hevseroka KCD'ê û parlamentera HDP'ê ya Colemêrgê Leyla Guven a bêdem û bêdorveger û da zanîn ku çala-

kiya wê li temamiya cihanê belav bûye û bang li hemû derdorên azadîxwaz bi taybetî ji yên rojhilatê Kurdistanê kir ku bi erka xwe ya şoreşgerî rabin.

Komên nû tev li greva birçîbûnê dibin

Çalakiyên greva birçîbûnê ya ji bo şikandina tecrîda li ser Ocalan li gelek deverên cihanê didomin. Di çarçoveya van çalakiyan de li navçeya Miçûrînsk a bajarê Tambovê yê Federasyona Rûsyayê, Meclisa Gelê Kurd ji bo bidawîbûna tecrîdkirina Ocalan dest bi greva birçîbûnê kir.

Bi heman armancê li bajarê Honnover ê Almanyayê jî kurdistanîyan dest bi çalakiya greva birçîbûnê kir. Greva ku bi pêşengiya Meclisa Jinê ya Ronahî dest pê kir dê hefteyekê bidome.

Konê greva birçîbûnê vedan

Bi sedan şênîyên navçeya Til Hemîsê ya girêdayê Kantona Qamişloyê bi dirûşma 'Ji Osmaniya nû re na' bi pêşengiya Kongreya Starê li dijî tecrîda li ser Ocalan li kolana giştî nêzî çerxeriya Şehîdan ji bo du rojan konê greva birçîbûnê vedan.

Li aliyê din çalakiya greva birçîbûnê ya Komeleya Karkerên Mezopotamayê li bajarê Silêmaniyê bi dirûşma 'Em ê sistema Îmraliyê hilweşînin û li gel Rêberê xwe azad bijîn' dabûn destpêkirin di roja

5'emîn de û bi koma 3'yemîn didome.

Her wiha çalakiya ku nûnertiya HDP'ê ya li Hewlêrê bi heman armancî dabû destpêkirin jî di roja 29'emîn de didome. Der barê çalakiyê de endamê nûnertiya HDP'ê Nasir Yagiz axivî û diyar kir ku heta tecrîda li ser Ocalan neyê rakirin dê çalakiya xwe bidomînin û bang li rêxistinên mafên mirovan ên Ewropayê jî kir da ku li dijî tecrîdê helwesta xwe nîşan bidin.

AMED



'Berpîrsayari' dikeve ser milê her kesî



Çalakiya greva birçîbûnê ya bêdem û bêdorveger a hevseroka KCD'ê Leyla Guven di roja 42'yemîn de berdewam dike. Piştî Guven li Girtîgeha Tîpa E ya Amedê dest bi çalakiyê kir, girtiye PKK'ê û PAJK'ê jî di 27'ê mijdarê de bi heman armancê li dijî tecrîdkirin û ji bo azadiya Rêberê Gelê Kurd Abdullah Ocalan dest bi çalakiya greva

birçîbûnê ya 10 roj a bêdem û dorveger kirin. Çalakiya girtiyan bi koma 3'emîn li girtîgehan berdewam dike. Niha ji hevşaredara Bajarê Mezin a Amedê Gultân Kîşanak bi heman armancê dest bi greva birçîbûnê ya 10 rojan kir.

Kîşanak bi rêya parêzeran agahî da û xwest demek berî demekê tecrîdkirina Ocalan bi dawî bibe û wiha got: "Ji bo tecrîdkirina birêz Ocalan bi dawî bibe ji îro û şûn de ez dikevim

greva birçîbûnê ya 10 rojan. Ez piştigiriyê didim çalakiya wekîla me Leyla Guven. Ji bo çalakî bi encam bibe û tecrîd bi dawî bibe berpîrsayari dikeve ser milê me hemûyan. Li aliyê din birêz Ocalan ji bo aştîya civakê pir zelal helwesta xwe aşkera kiriyê. Ji ber vê yekê ji bo aştî pêş bikeve û tecrîd bi dawî bibe, divê hemû wîjandên demokrat û yên aştîyê dixwazin bi hestiyar tevbigerin û berpîrsayariyê hilgirin ser xwe." AMED

Şênîyên Minbicê: Em xwediyên vê axê ne

Bi sedan şênîyên bajarê Minbicê û gundên wê li dijî gefên dewleta tirk a dagirker daketin qadan û meşek li dar xistin. Meşê li pêşîya Nexweşxaneyê El Fîrat dest pê kir û li qada giştî veguherî mitîngê.

Di mitîngê de hevserokê Komîteya Lîhevanîyê ya Minbicê Ebdilrezaq Îsmail axivî û diyar kir ku vîna gel nayê şikandin û dê nehêlên armanca dagirkeran li herêmedê pêk were.

Çîgirê hevserokê Rêveberiya Bakur û Rojhilatê Sûriyeyê Riyad Hefil destnîşan

kir ku armanca gefên dewleta tirk tevliheviya ewlehî û îstîqrara li herêmedê ye.

Cîgirê Komîteya Ciwan û Werzişê ya Minbicê Îmad Tirkmenî jî ev tişt anî ziman: "Gefên Erdogan û hikûmeta wî ya faşîst vîna me naşikînin, ji ber ku em xwediyê vê axê ne, ev ax axa gelê Sûriyeyê ye." Her wiha endama rêveberiya Meclisa Jinan a Minbicê Şîraz Xoco jî destnîşan kir ew wek jinên Minbicê gefên dewleta tirk şermezar dikin û nahêlin kes axa wan dagir bike. MINBIC



Hejmara leşker û polîsan ji gel zêdetir e!

Dek û dolabên hikûmeta AKP'ê yên li Kurdistanê jî bi hilbijartina herêmi naqedên. Yek jê cihê ku ev dek û dolab tên kirin jî herêma Botanê ye. Hat îdiakirin ku ji bo hilbijartina herêmi qeyda 3 hezar leşker û polîs li navenda Şîrnex û Bêşababê hatiye çekirin. Her wiha tê diyarkirin heman rewş li navçeya Silopiya û Cizîrê jî heye.

Parlamentêrê HDP'ê yê Şîrnexê Huseyîn Kaçmaz der barê mijarê de diyar kir ku wan ev yek ji çavkaniyên bawerî bi wan tê, teyit kiriyê û anî ziman ku tê gotin dê 4-5 hezar qeydên din jî li herdu navenandan bê çekirin û heman rewş li hin deverên din jî rû dide.

Kaçmaz destnîşan kir ku AKP dizane ger şaredariyên qeyûm tayînî wan hatine kirin bi dest nexa dê dawî li îktîdara wê bê û wiha

got: "Lê belê dê gel bersiva politikayên qeyûman bide."

Her wiha Kaçmaz da zanîn ku tevî hemû zext û zordariyan jî dê partiya wan şaredariyên li herêmedê hemû bi dest bixe û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Li hemberî vê neheqî û sextekariyê em bang li hemû şîrnexiyên koçber bûne û bang li hemû xwendekaran dikin ku beriya hilbijartinê qeyda xwe ya ji bo hilbijartinê kontrol bikin û qeyda xwe binin bajarê xwe." ŞÎRNEX



Îktîdara AKP'ê li ser xwîna kurdan dikeve hilbijartinê

Hevserokê HDP'ê Sezai Temelli di çarçoveya xebatên hilbijartina herêmi de li Mûşê bi gel re hat gelhev. Temelli ku xîtabî gel kir, bal kişand ser çalakiya Guven û anî ziman ku Guven 42 roj in bi beden, vîn û sekna xwe li dijî hijmendiya faşîst li ber xwe dide û wiha got: "Leyla Guven careke din bang li gelê Tirkîyeyê dike ku li aştîyê xwedî derkevin. Divê gelê Tirkîyeyê û hemû rêxistinên demokratîk li hemberî Leyla Guven hestiyar tev bigerin. Werin em bi hev re li vê têkoşîna aştîyê xwedî derkevin. Em ê bi têkoşîna xwe dawî li tecrîdê binin."

Her wiha Temelli herî dawî politikayên AKP'ê yên şer jî rexne kirin û axaftina xwe wiha bi dawî kir: "Kengî hilbijartin nêzik bibe iktîdara AKP'ê bi xwîna kurdan dikeve hilbijartinê. Divê em destûr nedin vê yekê. Ez bang li nûner û rêveberên rêxistinên civakî, jin û ciwanan dikim, ji şer re bêjin na û li vî welaî xwedî derkevin." Mûş





Ji bo komîteya destûra bingehîn li hev civiyan

CENEVRE - Wezîrê Karên Derve yê Rûsyayê Sergey Lavrov, Wezîrê Karên Derve yê Îranê Cevad Zarîf û Wezîrê Karên Derve yê Tirkîyeyê Mevlut Çavî-şoglû bi pêşengiya Nûnerê Taybet ê Neteweyên Yekbûyî yê Sûriyeyê Staffan De Mîstûra bi mijara

Sûriyeyê li Cenevreyê li hev rûniştin. Di civînê de her sê wezîr li ser avakirina komîteya Makeqanûna Sûriyeyê rawestiyan. Çav li rê ye ku Staffan de Mîstûra heta dawîya salê dawî li erka xwe bîne. Ji ber vê yekê ev civîn bû civîna dawîn a Mîstûra.

04

HSD parçeyek civaka Sûriyeyê ye

Nûnerê Taybet ê Amerîkayê yê Sûriyeyê James Jeffrey têkildarî bakurê Sûriyeyê daxuyaniyên balkêş dan û diyar kir ku hedefa wan a nihayî ew e ku HSD weke parçeyekî civaka Sûriyê bê dîtin. Jeffrey ji bo guhertina rejîmê jî got ku di bingeha polîtîkaya wan a Sûriyeyê de armanc ne ew e ku ji Beşar Esad rizgar bibin

Serokkomarê Tirkîyeyê Recep Tayyîp Erdogan di rojên dawî de gefên xwe yên li dijî bakurê Sûriyeyê zêde kir. Erdogan herî dawî angaşt kir ku ji bo êrişkirin û ango dagirkirina bakurê Sûriyeyê bi serokê Amerîkayê Donald Trump re hev-dîtin pêk aniyê û li ser mijarê li hev kirine. Piştî vê angaştê Erdogan anî ziman dibe ku her kêliyê bêtir ku xesar bidin hêzên amerîkî yên li herêmê êrişên bakurê Sûriyeyê bikin.

Di vê pêvajoya ku ev gefên Erdogan tên nixandin de Nûnerê Taybet ê Ame-

rikayê yê Sûriyeyê James Jeffrey ku li Atlantic Councilê beşdarî konferansekê bû û axaftinek kir, têkildarî bakurê Sûriyê û Sûriyeyê daxuyaniyên balkêş da. James Jeffrey di axaftina xwe de bal kişand ser gefên Erdogan ên rojên dawî ên li dijî bakurê Sûriyeyê û bi zimanekî vekirî diyar kir ku fikra êrişkirina bakurê Sûriyeyê ne fikrek e baş e.

Têkoşîneke baş didin

Jeffrey têkiliya Amerîkayê ya bi kurdên Sûriyê re jî şiband têkiliya bi

kurdên Iraqê re ya sala 2003'yan û derbarê hevkarîya wan a bi Hêzên Sûriya Demokratîk (HSD) re ev tişt gotin: “Têkoşîna li dijî DAIŞ’ê li berjewendîya wan e jî. Ne ku ji bo qenciya me dikin, ji bo ewlehiya xwe dikin. Dema sala 2014’an DAIŞ’ê li Kobanê ew tengavî şinorê Tirkîyê kirin, me bi wan re şîrkati kir. HSD têkoşîneke baş li dijî DAIŞ’ê dide.”

Jeffrey ji bo rexne û bertekên Tirkîyeyê yên ji ber berdevamkirina têkiliya Amerîkayê ya bi HSD’ê re jî ev tişt anî ziman: “Hedefa me ya nihayî ew e ku HSD weke parçeyekî civaka Sûriyê bê dîtin. Bi pêkahateyên jêrdewletî re pêwendiyên me nînin. Heger hûn behsa piştgiriyeke demdirêj a leşkerî û siyasî dikin, tu polîtîkayeke vê rêveberiyê (Amerîka) nîne. Di vê esase de polîtîkayeke rêveberiyên berê yên Amerîkayê jî nebû.”

Armanc Esad nîne

Li aliyê din Jeffrey têkil-



darî guhertina rejîma Sûriyeyê jî axivî û diyar kir ku di bingeha polîtîkaya wan a Sûriyeyê de armanc ne ew e ku ew ji Beşar Esad rizgar bibin û wiha got. “Em dixwazin li Sûriyeyê rejîm biguhêre. Mebesta me ne ew e ku em ji Esad rizgar bibin. Li Sûriyeyê 100 hezar milîtanên çekdar ên muxalîfên rejîmê hene. Ev jî nêzî fikra me ne. Heta rejîm şer bi dawî neke kes nikare alîkariya maddî bidê.”

Jeffrey bi bir xist ku di dema serokê berê yê Amerîkayê Barack Obama de polîtîkaya Amerîkayê li gorî çûna Esad hatibûye avakirin lê bi Donald Trump re guherînek derketiye holê û axaftina xwe wiha bi dawî kir: “Xala herî girîng a ku rêveberiya Trump li Sûriyeyê li ser wê disekine ew e ku divê yekîneyên çekdar ên Îranê yên ku piştgiriya didin rejîmê, ji welat derkevin.” **WASHINGTON**

Koordînatên hêzên xwe dan Tirkîyeyê

Di çapemeniya Tirkîyeyê de hat angaştîkirin ku Amerîkayê koordînatên hêzên xwe yên ku li bakurê Sûriyê dimînin dane Tirkîyeyê. Heke ev agahiya çapemeniya Tirkîyeyê rast be dibe ku Amerîkayê weke Rûsyayê di berdêla hin tiştan de destûra êrişa li hemberî Sûriyeyê dabe Tirkîyeyê. Her wiha çapemeniya Tirkîyeyê ragihand ji bo ku rewşa li herêmê vegere dema 2013'an dê Tirkîye êrişên xwe ji Grê Spî bide destpêkirin û bi vê yekê navbera herêma Kobanê û Qamişloyê ji hev qut bike. **ENQERE**



‘Piştgiriya alozkirina Rojhilata Navîn dikin’

Welatê Kendavê Qeter ku ji ber têkiliya xwe ya bi rêxistinên terorê re bi pêşengiya Erebiyana Siûdî û Mîsrê ji aliyê gelek welatên Kendavê ve hatiye dorpeçkirin, Erebiyana Siûdî û Yekitiya Mîmişînên Erebi bi alozkirina Rojhilata Navîn sêdar kir. Wezîrê Karên Derve yê Qeterê Şêx Muhammed Bin Abdurrahman Sanî têkildarî mijarê daxuyaniyek da.

Sanî ragihand ku Erebiyana Siûdî û Yekitiya Mîmişînên Erebi piştgiriya didin alozkirina Rojhilata Navîn û wiha got: “Tekane berpirsyarê alozkirina Rojhilata Navîn Erebiyana Siûdî ye. Em ne ligel Siûdiya ku Qeter dorpeç kiriye û şerê Yemenê dike ne.”

Sanî got ku Erebiyana Siûdî û Yekitiya Mîmişînên Erebi ji bo xerabkirina ewlekariya herêmê li Yemen, Lîbya û Somaliyê piştgiriya çalakîyên bi guman dikin. **DOHA**

‘Êlêkzer’ên Fasê jî çêbûn

Li welatê Afrîka Fasê jî hinek karkerên ku ji mehaneyên xwe ne razî ne ji bo başkirina mehaneyên xwe weke xwepêşandarên li Fransayê êlekên zer li xwe kirin û dest xwepêşanan kirin. Cîgirê Serokê Sendîkeya Teknîsyenên Fasê Zuheyr Îskarîbeh têkildarî xwepêşandanan daxuyaniyek da û ragihand ku teknîsyenên wan ji bo başkirina mehaneyên xwe di hinek wezaret û dezgeyên taybet de dest bi grevê kirine û ketine nav tevgerê.

Îskarîbeh her wiha da zanîn ku li ser mijarê bi hikûmetê re li ser maseyê rûniştine û li hev nekirine û wiha got: “Heke daxwazên me ney-nin qebûlîkirin em ê sibê û dusiba car din herin grevê û xwepêşandanên xwe bidomînin. Îskarîbeh destnîşan kir ku karkerên xwepêşandanan li dar dixin weke karkerên li Fransayê êlekên zer li xwe kirine. Balkêş e hikûmeta Fasê têkildarî çalakiya karkeran tu daxuyaniyek neda. **RABAT**



Rûhanî serdana Tirkîyeyê dike

Serokkomarê Îranê Hesên Rûhanî piştî gefên serokkomarê Tirkîyeyê Recep Tayyîp Erdogan ên li ser bakurê Sûriyeyê îro tê serdana Tirkîyeyê. Ofîsa Rûhanî têkildarî serdana Rûhanî daxuyaniyek da û diyar kir ku Rûhanî ji bo du rojan serdana Tirkîyeyê dike û dê bi şanda ligel xwe ya payebilind ên siyasî û darayî re bi serokkomarê Tirkîyeyê Erdogan re hevdîtinan bike.

Çapemeniya alîgir a AKP’ê jî cihekî berfireh ji serdana Rûhanî re veqetand û diyar kir ku dê Rûhanî û şanda ligel xwe beşdarî Konseya Pêwendiyên Stratejîk a 5’emîn bibin. Hat ragihandin ku her du welat jî dixwazin rêjeya danûstandîna bazirganiyê yên di navbera xwe de bigihin 30 milyar dolarî. Di serdanê de dê çend rêkeftinên aborî, çandî û siyasî jî bînin îmzekirin.

Dagirkirinê jî dinirxînin

Li aliyê din mijareke veşarî ya vê serdanê jî bêguman diyaloga ji bo dagirkirina bakurê Sûriyeyê ye. Weke tê zanîn Erdogan gef û gurên xwe yên ji bo dagirkirina bakurê Sûriyeyê zêde kirine û bi serdanê dixwaze ku piştgiriya jî Îranê jî bigire. Ji ber ku Îran jî di mijara destkeftiyên kurdan de ji Tirkîyeyê cuda nafikire îhtîmal heye ku di vê mijarê de piştgiriya bide Tirkîyeyê.

Hêjayî bibîbîrxistinê ye ku Amerîkayê di 4’ê mijdarê de danekirinên giran ên aborî dabûne ser Îranê. Îran jî ber ev danekirinên Amerîkayê di warê aboriya petrol û enerjîyê de gelek tengav bûye. Îran bi serdanên xwe yên bi vî rengî dixwaze bandora danekirinên li ser xwe sivik bike û piştgiriya bide plana dagirkeriya Tirkîyeyê ya ji bo bakurê Sûriyeyê. **TEHRAN**



PCF’ê parastina Rojava xwest

Partiya Komunist a Fransayê (PCF) têkildarî gefên serokkomarê Tirkîyeyê Recep Tayyîp Erdogan ên li dijî bakurê Suriyeyê daxuyaniyeke nivîskî weşand û bang kir. Di daxuyaniyê de hat ragihandin ku êrişa amadekariya wê tê kirin, li dijî tecrûbeyê pêşverû, aştîyane û demokratîk a kurdan e ku li ser rûyê erdê bûne hêza bingehîn a li dijî DAIŞ’ê.

PCF’ê diyar kir ku nepêkan e biryareke wiha bêtir danûstandinên bi Rûsyayê û fermanariyên leşkerî yên

Amerîkayê re hatibe girtin û ev daxwaz kir: “Fransa, Yekitiya Ewropayê û saziyên navneteweyî ji bo pêşî li sûcên nû yên şer bigirin divê tavilê bikevin nav liv û tevgerê.” PCF’ê destnîşan kir ku piştgiriya dide kurdan û hewl danên Tirkîyeyê şermezar dike.

PCF’ê di dawîya daxuyaniya xwe de bal kişand ser hewl danên navneteweyî yên ji bo pêşîgirtina hewl danên Tirkîyeyê û ev bang li Fransayê kir: “Ji bo Rojava li qada navneteweyî were parastin û dawî li polîtîkayên il-



legal û krîmînal ên Tirkîyeyê bê anîn, divê Fransa pîrsgirêkê bixwe rojeva Konseya Ewlekariyê ya Neteweyên Yekbûyî (KENY).” **PARÎS**

Beriya agirbestê dîsa şer dest pê kir



Neteweyên Yekbûyî (NY) beriya çend rojan nûnerên hikûmeta Yemenê û nûnerên Hûsiyan ji bo agirbest û lihevahîyê li Stokholmê li hev civand. Di vê civînê de aliyên li ser agirbest û ji bo alîkariya bi milyonan mirovên birçî vekirina korîdara mirovî li hev kir.

Beriya ku agirbest bikeve meriyetê aliyên careke din dest bi şerê li dijî hev kir û derbên giran li hev dan. AFP’ê têkildarî mijarê nûçeyek we-

şand û ragihand ku şer û pevçûnên di navbera aliyên de li Hudeydâyê careke din dest pê kiriye û li bajar topbaran hatiye kirin.

Li gorî lêhvkirina ku pêk hatibû heke şer û pevçûnan careke din dest pê nekirina duh agirbest diket meriyetê û ji bo alîkariya bi milyonan mirovên birçî korîdara mirovî dihat vekirin. Ji ber vê rewşa aloz hê jî aqûbeta 150 hezar mirovên asê mane ne diyar e.

Şerê navxweyî yê Yemenê jî adara sala 2015’an ve didome. Erebiyana Siûdî û Îran piştgiriya didin her du aliyên şer. Ji ber ev şerê navxweyî heta niha bi hezaran kesên jiyana xwe ji dest daye û bi hezaran kes jî ji cih û warên xwe bûne. Her wiha ji ber hebûna şer aborî û tenduristiya welat jî tîk çûye. Ji ber vê yekê bi hezaran mirov li Yemenê birçîne û bi nexweşiyên cuda bi wan re peyda bûne. **SENA**



Mesaj sey ‘delîlê endamîya rêxistin’ hesabîya

AMED - 9ê teşrîna verêne de bi qerarê Serdozgerîya Komarî ya Amedî 152 kesî ameybî tepîştîş û kesê ke ameybî tepîştîşî ra 26ê ci ameybî tewqîfkerdiş. Kesê ke ameyî tewqîfkerdiş ra yew zî Hemserekê HDPjî yê qezaya

Farqînî ya Amedî bî û 10. Mehkemaya Ceza ya Giran ya zî îdîname amede qebul kerde. Mesajê xebêrdayîşê yê derheqê defînderdişê cenazeyan ke Biçenî rê şiyêne sey ‘delîlê endamîya rêxistin’ vîna.

CPT gureyê xo nêkeno KE polîtîk têgêrena

Serekê pêroyî yê ÎHDyî Turkdoganî da zanayîş ke tecrîdê Îmralityî hindî agêrayo bi îşkenceyî, CPT gureyê xo nêkeno û Konseya Ewropa zî binpaykerdişanê heqan ê ûcayî rê bi hawayêkê sîyasîyî nîzd bena û va: “No tecrîd heman wextî de serê hemeyê cimati de zî yeno bicaardene.”

Serkan DEMİREL / BERN - ANF

Serekê Pêroyî yê Komela Heqê Merdiman (ÎHD) Oztürk Turkdoganî derheqê meseleyanê tecrîdo girankerde yê serê Rayberê Şarê Kurdî Abdullah Ocalanî, grevanê vêşaniyan ê ke seba paştîdayîşê çalakîya grevê vêşaniye yê Leyla Guvene ameyê destpêkerdene, polîtîkayê teberî û dewleta Tirkî û nîzdbî-yayîşê Rojawanî ser o qisey kerd.

Turkdoganî derheqê tecrîdî de wina va: “Tecrîdê serê Ocalanî heman wextî de vînayîş û fikranê ê ser o zî yeno bicaardene. Wazenê ke vernîya vilabîyayîşê fikranê ê bigîrê. Gama ke tecrîd kesêk ke hende cehdê aşîti keno ser o bêro bicaardene, no tecrîd heman wextî de serê hemeyê cimati de zî yeno bicaardene. Yanî temamnê cimati ser o tecrîd yeno bicaardene.”

Ganî CPT gureyê xo bica biyaro

Turkdoganî dewamê qiseykerdişê xo de va ‘Hemverê nê tecrîdî de zî cimati miyan de reaksiyonêk esto, cimat çalakîya Leyla Guvene rê wayîr vejêno’ û domna: “Hetêna ra yeno waştene ke no


hesasiyetê cimati bî zext û zordariyan bêro şiktene. Saziya Komîteya Vernîgirewtîşê Muameleyo Xirab û Îşkenceyî ya Ewropa (CPT) hendî tayê çîyan dana têro. Helbet Tirkîye meseleyê tecrîdî de CPTyî rê tayê çîyî vatê. Labelê CPT çîyo ke aye ra vajîyayê nê ganî gureyê xo bica biyaro, halî cayê ci de tesbît bikero û bi eşkerayî biyaro ziwan ke heqê Ocalanî yenê binpaykerdene. Gureyê CPTyî vernîgirewtîşê îşkenceyî yo. Eke CPT herinda vernîgirewtîşî de bi bîxemî têgêrena no yeno na mana ke gureyê xo bica nêana.”

Turkdoganî qiseykerdişê xo de qala kêmasiyanê Ewropa kerd û va: “Ma tiya vînenê ke kêmasî Konseya Ewropa de zî esta. Konseya eşkena hemverê binpaykerdişanê Tirkîye de hîna aktif têbigêro la însiyatifêkê winayênê nê-gêna. Mesela Kurdî ewro cayê ke ciwîyenê ê cayan de wazenê ke îdareyanê xo awan bikerê. Yanî wazenê ke heqê xo yê tewrbiyayîşê îdareyî bixebetnê. Eke Konseya Ewropa goreyê peymannameyanê xo têbi-

gêrayêne ganî paştî bidayêne nê heqê Kurdan, la wina aseno ke Konseya bicaardişê wezîfeyanê xo ra dûrî kewta.”

Pabesteyê dewletan a

Turkdoganî wina dewam kerd: “Tawîzê ke heta ewro ameyê dayene nê welatan de hetê heqanê merdiman û demokrasî ra faydeyêk nêresna, eksê nê de nê wareyan de problemî hîna bî gird. Na polîtîkaya Konseya bi îflasî qedîyaye. Nika Rûsya vejîyayîşê endamîya Konseya Ewropa ser o munaqeseyan kena. Ganî nîzdbîyayîşê dewlete û yê Konseya yewbînan ra ciya bibê. Konseya gureyo ke seba aye ameyo bewlîkerdene ganî bica biyaro. Ma vînenê tawîzê ke diyaî bi Tirkîye çiyêkê rindî nêard meydan, Tirkîye hîna ver bi xirabî ser berde. Tirkîye bi hawayêkê eşkerayî vat ke aye nêwazena Kurdî Sûriye de bibê wayîrê statu. No zî eşkera yo ke polîtîkaya şerî dewre de ya.”



‘Do îşgalkerdiş û faşîzm vindî bikerê’



Cinîyê Endamê Partîya Yewîya Demokratîke (PYD) derheqê tehdîdê Erdoganî yê serê Rojawanî de qisey kerdî û diyar kerdî ke wa Erdogan nêvajjo qey o do biêşko şarê Kurdî çin bikero, do qetî serkewte nêbo û ê do dagirker û faşîzm vindî bikerê.

Endama Meclîsê Cinîyan ê Partîya Yewîya Demokratîke (PYD) Şadiya Omere wina va: “Erdogan xeylê rey nê tehdîdan keno. Amancê ey o yo ke yewîya şarê Sûriye hedef bigîro. Erdogan eynî wextî de wazeno ke reyna DAÎŞ bi hêz bibo. O nê wazeno ke hizur bibo. Her wext waşt ke kaos tewr pîl bibo. Erdogan vano ke ez wazena teror çin bikero, la piştdayîş dano DAÎŞ. Wa Erdogan hewn û xeyalê vengane nêkero. Do qetî nê-êşko şarê Kurd çin bikero.”

Heto bîn ra Endama Îdareyê PYDyî Yeldiz Cûma zî wina va: “Dimayê îşgalkerdişê Efrînî Erdogan wazeno ke heme herra Rojawanî îşgal bikero û nêwazeno ke Kurdî bibê wayîrê statu. Wazeno ke faşîzm xo heme cayan vila bikero. La o do miyanê faşîzmê xo de şêro. Tu kes do nê-êşko yewîya şarê Kurd hedef bigîro û hêrişê destkewtêşê inan bikero. Do heme şarê Sûriye vera tehdîdê Erdogan vînderê. Wa Erdogan nêvajjo qey o do bi-êşko şarê Kurd biqedêno. Do qetî serkewte nêbo. Do îşgalkerdiş û faşîzm vindî bikerê.” *QAMIŞLO*

Dewlete nêwazena aşkera biba

Ewro serrgêra Qetliyamê Gumgumî ke 19ê Kanûna 1978î de pê ameybî ya. Qetliyam ra nata 40 serrî derbaz bî. Hedîse hewteyêk dewam kerd û elewî-bîyayîşê xo vera 111 kesî ameybî qetlîkerdiş, zêdeyê 100 kesî birîdar bibî û 70 kargehî ameybî weşenayîş. Şahidê

qetliyamî ra nuştux Aziz Tunçî qala Qetliyamê Gumgumî kerd. Tunçî qiseykerdişê xo de qetliyamo ke pê ame sey qirkerdişî bi name kerd û wina va: “Qetliyam çimanê pêroyê dinya ver de pê ame. Labelê reyna zî hetkarî nêdayî ma. Gumgum de bi



destê wezîfedarê siyasî, seba çînkêrdîşê muxalefetê komelî, pakîya etnik û olî dayî dest pêkerdî û bi no hawa qetliyam pê ardî.”

Tunçî dewamê qiseykerdişê xo de va: “Ganî merdiman tena nêewno hewteyê qetliyamî. Dewlete hetê caardişê polîtîk ê sistematîkî de wayîrê ce-ribnayîşan a. Seba qeradayîşê qetliyamê amadekarî ame kerdîş. Hemverê elewîyanê kurdî de 1967î de qetliyamê Elbistan, 1971î de Kirikkale û dima ra 1976î de Gumgum pê ame. Wexto ke qetliyam pê ame kerdoxê paramîlîter yê faşîstî Taxa Yorukselîmî de qehweyê elewîyan dayî guleyan ver. Ewja de Gijik Dedeyê (Sabrî Ozkan) ame qetlîkerdiş û dima ra pê-rodayîş virazîya. 19 Kanûne de sote-menîyêk eşî Sînemaya Çiçekî û startê Qetliyamê Gumgumî ame dayîş. 21ê Kanûne de zî di mamostayê şorişger wexto ke şiyêne keyeyê xo ameyî qetlîkerdiş. Dewlete nêwazena qetliyam bêro aşkerakerdiş.” *ÊLIH*

Dicle di hezarî serrî yo menzerayêka winasî nêdî

Qezaya Gêlî yê Amedî de visiyanîşê qapaxêkê Awbenda Dicle ra dima berzbîyanîşê sewîyeya awe ya Royê Dicle hewna zî dewam kena. Dereyê Dicle yo ke tede ge-ge berziya awe resna 6 metreyî, qismêkê Baxçeyê Hewselî yê ke Lîsteya Kultur û Mîrasî yê Dinya yê UNESCOyî de yê zî binê awe de mend. Ekolojîste

hewna menzerayêka winayêne nêdiye. Ma perçeyêkê xoza yê, serdestê ci nêyê. Ganî ma aye dir aheng de bê. Çîyo ke ma tayê pê rehet benê çînêbi-yayîş merdeyan o. La halê qapaxanê bînan ra ma bifîkar ê. Qapaxê bînî çîqa saxlem ê ma nêzanê. Baxçeyanê Hewselî zirarêko pîl dî. Nika seba yew qapaxî sewîye mabênê 4 - 6 metreyî de

bî berz, eke di qapaxî biyêne do mabênê 8 - 10 de biyêne berz.”

Bi awbendan cayê dereyî vurîya

Yanîca ke îfade kerde do herekiya-yîşê awe hewna hîrê rojî zî dewam bikero û heta nika panc qezayî û 11 mehlayî nê ra mutesîr biyê dewamê qiseykerdişê xo de nê va: “Bi viraziya-yîşê awbendan cayê dereyî vurîya. Riyê nînan ra bi desan tewirê heywanan ê doran ra biyî vîndî. Eslê xo de no qewimîyayîş do çiyêkê zaf muhîmî biyaro meydan. Heta manganê hamnanî mumkun nêyo ke ê qapaxan tamîr bikerê, na yewe ra do ro bi xuşe xuşe bi herekiyo. Viraştîşê awbendan sey marîfet zanê. 2014 de Sêrte de bê ke hişyarî bêro kerdene vernîya awbendî amîbî akerdebe, bi desan kesî awe de mendîbî û 6 kesan cuya xo vîndî kerdebi. Hedîse ra dima mucadeleyê huqûqîyî ra ti netîceyêk nêamebi girewtene.” *AMED*



Projeyê HES

û awbendan

îptal bîyî



3. Mehkemaya Îdareyî ya Anqara bi qerarê ‘faydeyê rayapêroyîye yê berzî’ heme projeyê awbend û Santralê Hîdroelektrîki (HES) û Projeyê HESî yê Mercanî ke 2003î de dest pêkerdîbî iptal kerde. Derheqê qerarî de Meclîsê Wa Munzur Bi Azadî Biherekiyo eşkerayî-yêka çapemenîye organîze kerd. Beşê Wa Munzur Bi Azadî Biherekiyo, hu-nermend Erdogan Emîr û xeylî hemwe-latîjî tewrê eşkerayîya ke Zîyara Ana Fatma de ame dayene biyî.

Bariş Yıldırımî ke eşkerayî wende da zanayene ke inan seba îptalkerdişê projeyanê awbend û HESan Dadgeha Îdarî ya Berze de dewa akarda. Yıldırımî va: “2010î ra nata dewa de averşî-yayîşî virazîyayî û tewr peynî mehkema qerarê ‘faydeyê rayapêroyîye yê berzî’ heme projeyê awbend û HESan iptal kerd. Qerar de ameyo vatene ke ‘heta qerarê raporê Ercnayîşê Tesîrê Dornekiyî (ÇED) lazîm nêyo nêro girewtene, viraştîşê awbend û HESan do hetê hu-qûqîyî ra bîisabet nêbo.’ Bî nê qerarî heme awanî û fealiyetê ke kewenê çar-çîwaya Planê Averşîyayîşî yê Bidewreyê Dergî yê Parkê Mîliyî yê Dereyê Munzurî zî kewtê halêkê bêhuqûqî û no qerar tesîrê Projeyê HESî yê Mercanî ke hewna fealiyet de yo zî keno. Tarîxê Tirkîye de reya ewilêne hetê mehkema-yêk ra ameyê îptalkerdene.” *DÊRSIM*



Occo Mahabad

'Bi Dizîka'

hat

"Bi Dizîka Were" navê pirtûkeke helbestan e. Pirtûk ji Weşanên Nayê derketiye û nivîskarê wê Occo Mahabad e.

Di nav tora civakî de ew gelekî tê nasîn, gelek helbestên wî tene belavkirin lê kes nizane ka ew kî ye. Ji ber ku heta niha kesî ew nedîtîye. Niha ew bi pirtûkeke din a helbestan li pêşberî xwîneran e. Em yeka din dibêjin, ji ber ku heta niha 4'ên din derxistibûn li gel ku hê jî kesî ew nedîtîye.

Li gorî agahiyên di pirtûkê de Occo Mahabad sala 1977'an li Wanê hatiye dinê. Li Stenbolê zanîngeh xwendîye. Axir jixwe, di hin kovarên weke Çirûsk, Asîva û Pêngavê de helbest û nivîsên wî hatine weşandin. Heta niha bi navê "Helbestên Dinîk" (Weşanên Ava, 2012), "Êşên Qehbîk" (Weşanên Do, 2013), "Rondikên Binevî" (Weşanên Do, 2016), "Dem" (Weşanên Na, 2017) çar pirtûkên wî derketine û îsal jî pirtûka wî ya bi navê "Bi Dizîka Were" derket.

Helbestên zimanekî sade

Ew helbestên xwe bi zimanekî sade dinivîse û ev sadebûn di nav tora civakî de balê dikişînin. Her wiha hinên ku helbestên wî xwendine û wekî deng li nav tora civakî belav kirine jî hene. Li ser malpera <https://occoma-habad.wordpress.com/> mirov dikare xwendina helbestên wî jî devê Mehmet Dogan, Mehmet Keskin, Bilal Akbaş, İrfan Gornu bibîne û hem wan bixwîne û hem jî li wan guhdarî bike.

Ev helbesta li jêr jî yek ji wan helbestên wî yê ziman sade ye:"

...
*Çi zemanekî bînamûs e/
Sextekar bûne rêzdar/ Diz
bûne xwedî mal û şexsiyet/
Kujer bûne zîlamên esîl û hêja/
Qûnek û dêlik bûne namûskar/
Gur û çeqel bûne dost û yar/
Yên bîxeyset bûne mirovperest/
Emrê evîn û sewdayê bûye pênc roj/
Êdî xêra dê û bav
/Kur û keçan nayên dîtîn./
Mixabin cih û war nemane/
Ji bo mirovên ku/Dixwazîn civateke paqij
ava bikin"* AMED

BI DIZÎKA
WERE
OCCO MAHABAD

Nivîsandin parçeyek têkoşînê ye



Nivîskar Gulgeş Deryaspî der barê berhema xwe ya nû ya bi navê 'Ez Ne Ez Im' de diyar kir ku berhemên bi zimanê dayikê di jiyana mirovan de xwedî cihekî taybet e û divê hemû jin li zimanê dayikê xwedî derkevin

Roza METÎNA / AMED - JINNEWS

Nivîskar Gulgeş Deryaspî xwedîya 3 berheman e. Berhemên wê bi kurmancî ne. Her sê berhemên Gulgeş ên *"Tariya Bi Tav", "Xezal", "Ez Ne Ez Im"* roman in.

Gulgeşê têkildarî berhema xwe ya herî dawî ya bi navê "Ez Ne Ez Im" de axivî û wiha got: "Dema ku jin bi pê-nûsa xwe ya azad, efsûnî û bi zimanê dayika xwe êş, bextewarî, serkeftin, serîhildan û gelek mijarên din bikaribe rave bike, wê demê ev yek wê jî civakê re bibe çavkaniya herî mezin. Divê jin jî hêz û pê-nûsa xwe bawer bikin. Loma min bi pirtûka xwe ya nû ya bi navê 'Ez Ne Ez Im' xwest ku dev ji nivîsandinê bernedim û pê-nûsa xwe xurtir û mayînde bikim."

Deryaspî da zanîn ku mijara pirtûka wê ya Ez Ne Ez im li ser derû-

niya mirovan e û wiha got:" Di romana Ez Ne Ez im de em li bûyerekê rast nayên. Ez Ne Ez Im têkiliya bin-hîşîya kesekê yan jî kesekî rave dike. Min xwest bi romana xwe ya herî dawî şewazeke cuda biafirînim. Lê ez dikarim bibêjim ku berhemên min di bin bandora hevdu de mane. Dema ku min pirtûka xwe ya herî dawî çap kir ez gelek kelecani bûm. Kelecana her berhemên min cuda bûn. Ev cudabûn kêfxweşîyek mezin dide min. Ger ev kêfxweşîya min tune be ez ê nikarî-bim wê hêzê bi xwe re bibînim ku bi-nivîsim. Lê ez dixwazim berdwamiya nivîsandina min bê. Ez dixwazim ji jinên din re jî bibim mînak. Dema ku ez di warê parastina zimanê dayikê û nîrxên civakî de bibim mînak ev yek dê min gelek

bextewar bike."

Nivîskar Deryaspî bi lêv kir ku nivîsandin li gorî wê amûrek berxwedanê ye û wiha dewam kir: "Pêwîst e kesên kurd in bi kurdî binivîsin. Divê hemû têkiliyên me bi kurdî bin û kesên ku ji zimanê dayikê re xizmetê dikin em piştigiriyê bidin wan. Divê em bi berhemên xwe li kevneşopiyên xwe xwedî derkevin û peyama parastina nîrxên civakî bidin. Min bîrîyarek daye. Ev bîrîyar jî ew e ku ez ê nivîsandina romanê bidomînim. Ez ê nivîsandina bi zimanê dayikê her jî xwe re wekî peywîrek girîng bibînim û bidomînim. Nivîsandin jî bo min parçeyeke têkoşînê bi xwe ye. Bi vê yekê ez dixwazim bibim lingekî têkoşîna gelê kurd. Heta ez sax bim ez ê her di xizmeta wêjeya kurdî de bim."

Ji xwe bawer bin

Deryaspî bal kişand ser hêz û hebûna jinê ya di qadên cuda de û wiha dawî li axaftina xwe anî: "Her jinên ku di qadên cuda de dixebitin divê mil bidin hev. Ji bo pêşxistina civakê û destkeftiyên xwe têbikoşin. Hêza jinê bandorek mezin li ser civakê çêdike. Divê jin her jî hêz û têkoşîna xwe bawer bin û ji bo civakê bibe jêderka feyzê. Di qada ziman û wêjeyê de kêmasiyên ku hene bi hewldana jinê dikarin bi dawî bibin. Divê jin li zimanê dayikê xwedî derkevin. Çimkî zimanê dayikê hêviya mirovan geş dîke û xizmetê jî hebûna civakê re dike. Dema ku kêmasiyên di qada zimên û wêjeyê de bi dawî bibin dê ev yek bingeha hêzeke mezin ava bike. Loma nêrin, hebûn û sekna jinê xwedî taybetmendiyek girîng e."

Li Misrê goreke 4 hezar û 400 salî hat dîtin



Li sîteya Sakkara ya li nêzî paytexta Misrê Qahîreyê, goreke 4 hezar û 400 salî hate dîtin. Li gorî agahiyan, gora ya rahîbekî ye.

Têkildarî mijarê Wezareta Antîkayan a Misrê daxuyaniyek da û destnîşan kir ku gora rahîbê bi navê 'Wahtye', ji serdema Xanedaniya 7'an (BZ di navbera salên 2500-2300) e. Hêjayî bibîrxistinê ye ku di wê serdemê de firewn Neferîrkare (BZ 2446 û 2438) li ser desthilatdariyê bû.

Di daxuyaniyê de wezîr Halîd Enanî anî ziman ku gora ku ji hundir ve bi

peykeran hatiye xemilandin, baş hatiye parastin. Enanî destnîşan kir ku rahîbê gora wî hate dîtin, encamêkî çîna bilind bûye. Hate gotin di hundirê gorê de nîşaneyên dayik, hevser û malbata wî, her wiha gelek klûbe û peyker jî li gorî hatine dîtin.

Li goristana bajêr a Sakkarayê bi taybetî piramîda navdar a firewn Zoser heye. Ev avahiya ku dema Beriya Zayînê sala 2700'î jî aliyê Mîmar Îmhotep ve hatiye çêkirin, yek ji avahiya herî kev a li ser rûyê erdê ye. *QAHÎRE*

ZINDANA DİLŞAHA ÊZIDÎ

Li navçeya Ebexa Wanê zindana ku di sedsala 18'emîn de ji aliyê Kok Axayê Êzidî ve hatiye çêkirin û ji aliyê keça wî Dîlşah ve hatiye birêvebirin ev 301 sal in li ser pêya ye.

Zindan ji aliyê ermenan ve wek 'Qubîka' tê binavkirin. Zindana ku lênêrîna wê nehatiye kirin û di kelehê de cih digire niha bi xetera tunebûnê re rû bi rû ye, gelek caran rastî êrişan hatiye. Keleha li qûntarên çiyayê Arikelle cih digire tê de zindan jî heye û bi giştî ji 12 beşan pêk tê. Dirêjîya zindanê 15 metre ye û firehiya wê jî 8 metre ye. Tê gotin zindan ji aliyê keça Kok Axa, Dîlşahê ve hatiye birêvebirin.

Kesên li gundê Sagmali ya Jor dijin, diyar dikin ku kesên berjewendiya gel nediparastin di vir de dihatin cezarkirin. Gundîyan her wiha bi lêv kir ku kesên zirar dane zarok û jinan û dizî kirine li vir hatine cezakirin. *WAN*

